# Dilopeka

## Xwîna Dila

Hozanvan Cankurd

Weşanên Rewşen 1

K.L.1618
922 CAN DIL
INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHEQUE

## *Diyarî*

*Ev dilopên xwîna dilî*
*diyarî ne bo xebatkarên*
*ku di vê dema reş de,*
*li gund, çiya, bajar û*
*bendexanan û li hemû Kurdistanê*
*xebata xwe bo serxwebûn û*
*azadiya welatê xwe û*
*bo pêşkevtina mirovan*
*berdewam dikin.*

# Dilopeka

## Xwîna
## Dila

## Hozanvan
## Cankurd

WEŞANÊN REWŞEN
1

WEŞANÊN REWŞEN 1
Dilopeka Xwîna Dila - HELBESTÊN KURDÎ

Çapa Yekemîn: Cotmeh 1988

Xwedî:
YRWK
Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan
Max Str. 50
5300 Bonn 1 / BRD

## SERECEM

Rûpel

### DILOPEKA XWÎNA DILA


Dexsîna dilê min ........ 13
Dewrana Kurdan ........ 16
Newroz ........ 18
Newroz ........ 20
Strana lawikê gundî ........ 21
Bilbil ........ 24
Rewşa min û welatî ........ 26
Ez û kewî ........ 28
Xulî li we ........ 30
Li paş dîwarên bêdengiyê ........ 32
Çerxa zorê ........ 34
Xewnên min ........ 35
Dem bihare ........ 36
Heval Berzencî ........ 38
Dem ........ 40
Dayîka min ........ 42
Xencera eşqa welatî ........ 44
Newroz ........ 46
Welat nadim ........ 48

**HINDE LÊDANÊN DILÎ**
Cotyaro ... 53
Karker ... 55
Rêhevalê min ... 57
Reyên welatê min ... 59
Xwînrêtinê Kuba vejand ... 62
Helepçe ... 64
**PÎROZÎ**
Welatê zayînên teze ... 69
Bo Sirwe ... 71
**MERŞÊN LAWAN**
Canfîda ... 77
Merşa lawan ... 79
Baran barî ... 80
Lo hevalo! ... 81
Ax Kurdistan! ... 83
Lawî Kurd ... 84
Hunermend ... 85
Banga cengê ... 87
**DERKETÎ**
Derketî ... 93
**NALÎNA SÊWIYÊ KOÇER**
Nalîna sêwiyê koçer ... 105
**HELBESTÊN WERGERANDÎ**
Hespê sipî ... 115
Çi jê ma? ... 116
Gotin ... 118
Rewşname ... 119
Di tava hêvê de ... 124
Bênder ... 126
Pirsên çalê ... 129
Leşkerên hêviyê ... 131
**TÊBÎNÎ** ... 137

# Dilopeka

## Xwîna Dila

Hozanvan Cankurd

## Dexsîna dilê min

Dexsîna dilê min ji van tivîrkane
Welatê wan li pişta wane
Û jiyana wan geryane
Derbas dibin tixûbên dûr
Û sînor di zimanê wan de nihane...

Dexsîna dilê min ji van zarokane
Evên ku bi roj dilîzin,
Dibezin...
Dimîzin...
Û di xewnê de lîstikan dibînin
Û hêviyên mezin ji xwe re diçînin
Û nizanin ku ba tijî jehre
Av tijî jehre
Û pîvaza ku em ji enkûrê hildikin
Û her tiştekê ku em dixwun...

Dexsîna dilê min ji masiyên deryane...
Û ji van trênane
Evên ku di şeva reş de
Dibezin di rê de
Derbasdibin tixûbên welatê min
Û hîn wê de...

Tenê xwe rûdinim
Di bêdengiya şevê de
Weke melayê di nimêja sibê de
Û dostan di bîra xwe de
Yek bi yek dijmêrim
Li deriyê malê dinêrim
Û guh didêrim,
Ku yek ji wan bê
Di vê tenahiyê de...
Xerîbiyê!
Te hestiyê min hêra
Ezê giliyêd xwe bikim
Lê ji kê re
Ji kê re...

Dexsîna dilê min ji van hunermendane
Kela dilê xwe dirêjin
Û hesretên xwe dibêjin
Û jiyana wan eşq û strane...

Xerîbiyê!
Te ez girtim bi dava
Weke mirovê kûr ji herdu çava
Te lingêd min xistin kemenda
Û bi ser de anî lehiya van derda...

Xerîbiyê!
Ezê xwe azakim ji van koletiya
Û ji van derda...
Ezê xaniyekî xwe li gundê me avakim
Û bîranînêd xwe ji razanê rakim
Ezê dilê dayîka xwe şakim...
Ezê divîtê xwe bavêjim
Û van dilopên xwîna dilî narêjim
Narêjim...

1986

## Dewrana Kurdan

Çima em Kurd li hev nakin
Ji hevdu re xwe kêm nakin
Bi roj û şev li hember hev
Tivingdarin û çalakin?

Çiqas dijmin bi wan kenîn
Xwe dan rex wan û vê re çûn
Belê bo hev xwe nerm nakin
Şerê nav xwe ji bîr nakin

Hinek xulaman ji bo Tehran
Dibin Pasdar dijî Kurdan
Hinek bêvac diçin Bexda
Gelo caşin xwe çênakin!..

Çi rewşe ev, çi dewrane
Serok pirbûn, genim şîn bûn
Li Ewrupa serî dane
Çi zanane, xwe şaş nakin...

Gelo dijmin cudakare!
Ji bo Kurdan bi hev nare
Çima em tev nehişyarin
Ji serpêkan xwe fêrnakin?

Eger carek li hev rûnin
Civatek xwe bi hev xînin
Hinek hêja bidin pêş xwe
Emê dîsa xwe azakin

Berê zûde me pir xwîn da
Welatê xwe ji dest berda
Nêçîra hev bi roj û şev
Gelo kengê emê rakin?

Me dil westî bi gazînê
Dikim qêrîn bo yekbûnê:
"Bi hevkarî dibin serbest",
Gelo raste... çima nakin?

1985

## Newroz

Destê xwe da min
Çava de mizgîn
Pirsek gote min
Xemên min revîn
Gote min: "Hevalo!
Ez têm ji Şemdîn
Lawan seranser
Keçên nazinîn
Bona Nûroja
Rabûn ji mal çûn...
Dema êvar bû
Şev bû li gundan
Agir, alavbû
Li sirt û çiyan
Diya me rabû
Hêstir di çavan
Ew gelek şabû
bi cejna Kurdan...

Va gelek salin
Bizot dibarin
Xort û hevalan
Gerden li dar in
Her alîkî me
Dijmin, neyarin
Wek gur û keftar
Gergîn û harin...

Lê dost û heval
Hene li her der
Hinek reş û zeng
Hinek sor û zer
Li gişt welatan
Heye ceng û şer
Îro Salvador
Sibê Wêranşahr
Niha li Şîlî
Sibê li her der

Rizgar dibin tev
Gelêd milletan
Bo Newroza xwe
Em jî didin can.

1983

## Newroz

Pîrozî tu cejna dila
Cejna kulîlk û bilbila
Xweşî te dayî bendiya
Geş bûn rîhan û sorgula...

Pîrozî tu cejna bedew
Azaye dil, serbeste kew
Em tev dibêjin herbijî
Bûka çiya, roja netew...

Pîrozî tu li her dema
Xweşin bi te dar û çema
Em tev bi te dilşa dibin
Tirsa neyar dil de nema...

Pîrozî tu bi roj û şev
Te şên kirî jîna me tev
Gelek hêvî te dayî me
Destên bira gihane hev...

Pîrozî tu Newroza me
Bi xêr tu hatî mala me
Silav ji bo Artêşa Gel
Rizgar dike welatê me...

1987

## Strana lawikê gundî

Lo çiyayo!
Wek dilê min...
Çi dinalî?
Çi dibêjî?
Va evînê tu helandî
Dil li te ev ro kelandî
Her bi jan û mest û gêjî...

Rê diçin nav deşt û gelya
Av diçin rûbar û derya
Lê tenê ez wek firinda
Nolê baza...
Bo te hatim
Lo çiyayo!
Dilbirîno!
Bo te hatim
        Bo te hatim...

Bilbil û qumrî û qaza
Bo çi nînin?
Bo çi najîn?
Nêrgiz û sosin di gunda de
Va dema pûç û tehl de
Bê hevalin...
Bê xwedanin...
Mane bê av
        Mane bê jîn...

Lo çiyayo!
Va giya ev ro melîle
Wek mirovê badenoşe
Bê xinavê her nexweşe...
Vane ewrên reş giranin
Her bi baranin
Bi befrin...
Bo evîna dilxwaza...

Lo çiyayo!
Kî ji te pêve dizane
Van gihanên ewr û baya
Bo hejarên me bidoşe?

Va li deştê buye havîn
Zar û mindal
Boyî şîr û nanî digrîn
Nîne arvan
Nîne aşvan...
Bo me Kurdan her wehaye
Wek etûnê...
Birçî bûne...
Hem belengazî li dare
Hem jî wêran...

Lo çiyayo!
Kî ji te pêve dizane
Bo me Kurdan
Bo hejaran, rê kîjane...
— Ho kurê min!
        Lawikê min!
Vaye rê herdem xweyaye
Rê ji xwîna goriyaye
Rê hewara girtiyaye...
Ho kurê min
Cerg û mêlak û dilê min!
Rabe lezke
Bo xebat û têkoşînê
Pir derenge
        Pir derenge...
Rêka Kurdistanê vaye
Rê tivinge...
        Rêka Kurdistanê cenge...

1985

## Bilbil

Bilbilê dilsotî gote min:
Xurbet bi min wek dojehe
Agir di bin de her dema
Hovan hêlîna min birin
Bo min hema tiştek nema
Bê mal û der dinya çiye?
Dil bû kunê derd û xema
Dûrim... li derve bêkesim
Naçim cihên saz û sema
Cîhana min de roj niye
Jehre bi min ava çema
Çibikim hevalo, bêje min!
Sebr û tewata min nema...

— Ho bilbilê dilkul were!
Dermanê te bêjim te re
Nola te me li xurbetê
Gora reş û ax li sere
Derdê welêt ez sotime
Axîn dilê min de pire
Ê ku welatê wî tune
Erzane ew... kes nakire
Ê ku welatê wî heye
Jîna wî de roj namire...

Berve welatê xwe here
Herdem debanê hilgire
Te maf niye bê ceng û şer
Jîna gelan, ceng û şere...

Bilbil serî bo min hejand
Lezkir û çû balafirî
Rojek li vir ya dî li wir
Pişt re gihaye "Agirî"
Çû şer bike bona welêt
Dij wan kesên hêlîn birî...

Hirçek ji wê ve hate pêş
Serhişk û reş nola kerî
Weke kelat rawestiya
Bilbil li ber nazivirî
Lêdaneka bilbil li wî
Hirçê qelew berda girî
Bilbil nikil kir çavê hov
Bazda û çû... çav lê çirî...

1984

## Rewşa min û welatî

Dîsa li min şev hatiye, dem harbuye, roj bûne sal
Kovan û jan jîna min de cî girtine, şev bûne çal
Kuve herim, nola melê gawir buye, bê war û mal
Nalnale dil, Birca Belek wêran buye, mîna berê

Dengê dile wek zengile, dinya hejand û kir fela
Her dostekî derdek heye, bo min tenê koma bela
Va dojehe, kes tê niye, ne'j musliman û ne'j fila
Bo min tenê dergeh vebû, wan gote min: Fermû herê!

Hizr û xema xwe dane hev, ji her deran hatin dilî
Berbade ew, lê kul vebûn wek kaniya av xulxulî
Tev dûrketin dostên kevin, ji bîr kirim, nakim gilî
Tirsa mine bimrim wekî kundê şikêr li va derê

Jîna mi de şadî nema, çavên mi de ronî nema
Reş bûn bi min saz û sema, hişk bûn li min avêd çema
Çerx û felek bervaj gerîn, wêrankirim van serdema
Nêzîk ditê dengê lehî, rêwî giha nîvê pirê

Jîna xwe de aza nebûm, loma ji bo we her dibêm
Ey Kurdino bi hevre bin! Bo hev nekin çi karê kêm
Şano yeke, qeşmer pirrin, karê tecala ez neşêm
Pêşve diçin... paşve ditên... wenda kirin dûzana rê

Wax Kurdino, serhişkino! Herdem ji hev hun çi divên?
Nava we de hevkuştine, bi ser we de dijmin ditên
Talan kirin mal û pezan, dar û rezan, hesp û mehîn
Hey wax li we! Hey wax li min! Bo me nema cilkê kerê

1985

# Ez û kewî

Ber destê sibê
Rabûm ji xewê
Dengek hat ji çiyayên welatê min
Qebqeba kewî kete guhê min
Got Min: "Kurdo!
Tev jan û derdo! Çi heye li welatên biyanî?
Bo çi te serî ji mal hilanî?
Bîra te dikin
Çi mêr û çi jin...
Rêhevalên te... Dostên kevin...
Bîra te dikin
Çiya û zinar
Çîmen û kanî..."

Min gote kewî:
"Ji min çi divê?
Li min tengijîn
Her cî û her der
Rê li min birrîn
Leşkerên Tater
Bi zor û setem
Ji mal çûm der..."

Kewî dîsa kire qebqeb û got:
"Te erzan firot dêrîna bavê
Va li te digrîn kaniyêd avê
Li te dikine gazî û hawar
Diya te... merx û belan û çinar
Çima venagerînî silavê?"

Min got kewî:
"Dûrketin bi min gelek girane
Şevên Bonnê bûne bendexane
Hêstir di çavên min de nemane
Rê li min tariye... nehane..."

Min û kewê xwe ji hev fêm nekir
Min çi jêre got, wî dil nekir
Min dest dirêj kir
Destê min nebir...
Ez çûme ber lingan
Kew bû kevir...
Kew bû kevir...

1984

# Xulî li we

Xulî li we Kurdên çiya
Rojek nebûn yekdest û dar
Hevdu dixwun nola gura
Bona bira hun bûne mar
Van dijminan em rût kirin
Em kût kirin
Lîstik ji me
Bo zarokêd xwe çêkirin
Lê em hema hişyar nebûn
Em qet ji wan aza nebûn
Her kole man
Barê giran
Li ser milan
Roj û şevan
Hêstir dikin
Çavêd jinan...

Xulî li we ey Kurdino!
Herdem dikin peyv û "cedel"
Heya "ezel"
Lê bê "emel"...

Xulî li we
Ewên dibên em rêberin
Lê bê guman
Pir kes ji wan nola kerin
Bo dijminan bûne xulam
Caşin, li wan nekin silam
Bona pera
Dij hev dikin ceng û şera
Rabûne hev bi zir- zira...

1986

## Li paş dîwarên bêdengiyê

Ba rawestiya
Tiştek nalive
Sipîndar û sic nahejin
Heyv di cî de rûniştiye
Û dêmê keça min a piçûk
Ji qehra çelmisiye...
Ewrêd ezmanî
Weke hêştirên ku mexel bûne
Li deryayê bê dawî dinêrin
Û ji tehna melûl bûne...

Bêdengîyeka bi sur
Li ser sîngê gerdonê rûniştiye...
Bêdengiye li zeviyan
Li co û cobaran
Li çerx û felekan
Li ser reyêd asinî,
Û xulî li her derekê belav buye...
Bêdengiya radioyane
Û van çayxanane...

Lê ji dûr ve...
Ji Afrîka,
Gum-guma diholane
Straneka reşane:

"Em tên ji Sowêto,
Li ba me mirov her tên kuştin
Û reyên goristanan bi hêstiran
Tên şuştin..."

Li paş dîwarên bêdengiyê
Li Kurdistanê,
Û li Tirkiyê
Teq-teqa tivingane.
Dibêjin ku ji zûde
Şoreş karê Kurdane
Û serhildan jiyana wane...

Mirovin...
Dixwazin serxwebûna xwe
Rojeka nû
Dixwazin mirovatiyê,
Azadiyê...

Li paş dîwarên bêdengiyê
Kenê zarokan tê guhêd min
Hêviyeka tijî jîn
Digihîne dilê min
Û bihneka welatê min ê dûr
Derbasdike tixûbên
Xerîbiya min...

1986

# Çerxa zorê

Vaye çerxa zorzilamane, birano!
Bê debana xwe neçin derve ji malan
Her li ber derga hene keftar û maran
Daketin gur nav beyaran, ser newalan

Vaye çerxa bîjiyaye her wihaye
Bo me gore, kûr û tarî, serde kevirin
Koletî bo me tenê maye li cîhan
Herkesî yara xwe girtî, em jî bigirin
Van gelên dinya ji bo ala xwe xwîn dan
Ma çima em jî ji bo ala xwe namirin

Berger û destmaçkirin, boyî me şerme
Em nema deynin serî, nolê xulaman
Bo beg û axan ji nû ve em peyabin
Rûçikêd xwe xwar bikin boyî şeqaman
An ji bo dijmin bibin berdest û kole
Jêre em herdem bibêjin sed silavan

Hin dibêjin: "Serxwebûn nayê bi zorê"
Her li ber dergahê dijmin, çav li jêrin
Rojê cengê, kes ji wan nîne li qadan
Lê segên ber lingê dijmin, tevde şêrin
Serbilindî nayê, ger ew her wisa bin
Bo neyaran dergevanin, ew çi mêrin?
Xwefiroşin, gel disojin bi nivîsan
Guh nedin wan, rê nedin wan, kêrî-karin...

1984

## Xewnên min

Dibû havîn li gundê min
Ji beza nav çol û reza
Ji gera ber av û çema
Diwestiyan hestiyêd min...

Li ser pişta xaniya bû
Li bin stêrkên kadizê bû
Ciyê xew û razana min...

Dengê çivîk û kuliya
Ken û henekên zeriya
Xew didane ber guhêd min...

Gilgamiş û Rûstemê Zal
Hamzeyê pehlewan û Tecal
Dibûn siwarêd xewnên min...

Xerîbo lo! Kes nebîne
Xewnên te li vir çi bûne?
Tenê darên daşikîne
Xerîbo lo! Mirov çi bûne?

Xeribo lo! Kes nebîne
Xewnên te li vir çi bûne?
Tenê şarên hilweşîne
Xerîbo lo! Mirov çi bûne

1984

## Dem bihare

Wek dilê min,
Kohê (çiya) Agrî berf û sare
Wek leşê min,
Kela Babîl tar û mare
Çi zemane?
Sert û hişke wek zinare
Negrî... negrî
Dilbera min!
Negrî... negrî
Xanima min!
Dem bihare...

Şev dibirin,
Guh didêrim nalîna te
Xweş dibîsim gazina te,
Axîna te...
Çi zemane?
Va şikestî tenbûra te
Hilweşîne hêviyên te...
Negrî... negrî
Dilbera min!
Negrî... negrî
Xanima min!
Dem bihare...

Her di rê de xwîn rijandî
Dayîka te, bi ahîna tu mijandî
Dilbirîn û her nexweşî
Bi evîna "Serxwebûnê"
Mest û gêjî... badenoşî...
Negrî... negrî
Dilbera min!
Negrî... negrî
Xanima min!
Dem bihare...

1982

## Heval Berzencî

Heval Berzencî
Çima tu zû çû?

Dilê te nazik
Xencera Kurd bû
Zimanê çalak
Zû de azad bû...

Heval Berzencî
Serê xwe rake!
Kevrên gora reş
Hilo belavke...
Çerxa mirinê
Daxe, dutake...

Destê xwe hilde
Hawîr te darin
Zaro dilîzin
Berxik diçêrin
Bilbil dixwînin
Li te dinêrin...
Dengê billûrê
Kewan disoje
Ji her gulek şeng
Hingiv dimêje

Hemû azane
Tenê me doje...

Heval Berzencî
Çima tu zû çû?
Newroza Kurdan
Îsal birîn bû
Stêrk li ezman
Bo te rijî bû
Gelê Kurdistan
Li ber te rabû...

1982

## Dem

Dem dema cenga girane
Ceng dijî çerxa gelane
Cenga zordar û dizane
Dij mirovên gişt cîhane...

Dem dema bahoza zore
Va xulî dîsa dibare
Dêmê Kurdistana narîn
Ji xwînê rengê sore...

Dem dema Kurdane, yadê!
Tev diçin kar û xebatê
Bo welatê xwe avakin
Bo azadî... bo felatê...

Dem dema xortên çiyaye
Dem ciwane, her bihaye
Bê lez û bez em dimînin
Rê dirêje, pir jê maye...

Dem ji bo me serpêhatî
Nabe xweşî, bê yekîtî
Tev nebin yek ên belengaz
Wê hebe tarî, reşantî...

Karker û cotkar û lawan!
Bê yekîtî nîne derman
Tev bi hevre herne qadan
Bo demek nû, boyî Kurdan...

Zincîrên dijmin rizîne
Bendexanên wan şelîne
Tirs ji wana êdî nîne
Hevre rabin, dem xwîne...

1982

## Dayîka min

Min dayîka xwe, hildaye ser pişta xwe
Li cîhanê digerim
Gund bi gund
Şar bi şar...
Ta ku dermanekî bibînim
Jana dilê dayîkê vemirînim

Dayîka min çav di zindan û şikevtan kûrbûn
Di kar û barê axan
Hestiyêd pişta dayîkê zerbûn
Tev hate xwar
Kela Mardînê, li ber gullan û topan
Bû tar û mar...
Dayîka derd giran!
Dil bi jan!

Li Parîs û London dermanê te nîne

Ji kêmhişiya lawan
Te girt wêran...

Dayîkê!..
Hêstirên sêwiyan nagerînin aşên gelan
Birçî û tazî
Têr nabin bi civên parsekan
Derdên me çênabin,
Bi nivîştan

Divê te dîsa, li mal vegerînim
Nav gulîlk û baxan
Nav genimên deştan
Bidim te
Bi destêd xwe ava kaniyan...

Wê bike guvguv bayê sirtan
Wê hilkişe ji newalan mij û dûman

Wê bite guhên te dengê şalûl û şivanan
Lawjanên zarokên dibistanan
Wê bicivin li hawîr te
Mêrxas û pêşmergan
Weke piling û şêran
Wê dermanekî ji te re bibînin
Weke çawa pêşmergeyên Kuba û Vietnam
Ji dayîkên xwe re dîtin
Çare û derman...

Erê dayîkê..!
Li Parîs û London dermanê belengaza nîne...

1983

## Xencera eşqa welatî

Serdema derd û xema ye... Şîn û derde
Xencera eşqa welatî min di dil de
Gerdenê min daye ber kêrê ji nû ve
Min ne dest û ne ziman û ne jî lêve
Her dinalim, mîna bilbil, bê tewatim
Buye zindan, bendexane min welatim
Pîremerd û Ehmedê Xanî û Nalî
Çûn bi hesret, çûn bi kovan, çûn bi talî
Ez nizanim va çi çerxe bo me Kurda

Keştiya me her şikestî nava pêla
Her bi gazî, her bi qîr û hêle-hêla
Kes ji me nîne bi xweşî, bê birîna
Tev belavin li beyara nolê dîna
Nûnerên gel ên belavin li cîhanê
Çûne parsê, lê mixabin tişt nedanê
Hin derewker bûn serek nava welatî
Her dibêjin: "Serdema cengê nehatî"
Hin hene nola peyane bo neyaran
Her li bal wan in ji bo derman û çaran
Hin li derve xwefiroş û patexurin
Wek kerê birçî û bê hiş çav li tûrin
Ser milên gel distînin navan û zêra
Paldidin rûvî, ketin nav lanê şêra
Her dibêjin: "Em serokin, hûn nezanin"
Lê birastî! Gel şiyare, pê nikanin
Wer xwe dane rex neyara zirt û zirtin
Rojê cengê rev-revokin, kab lê sistin
Kes nema êdî ji bona wan geda be
Her li ber dergayê dijmin nolê sa be
Va gelê me nayê xapandin bi forta
Pir ket û rabû ji van çalan û korta
Şoreş û cengê dizanin kîne em Kurd
Herbijî şoreş ji bo serbestiya Kurd...

1985

## Newroz

Wek qurmekê dara gulê
Her salekê şiqin didim.
Tarî û şev min nasdikin
Tîrêjeka rojê me ez...
Min lêvdikin li her deran
Ez dame ser çav û seran
Van Kurd hemî min hezdikin
Hozaneka Xanî me ez...
Her dijminê tariyê me
Rûpeleka şoreşê me

Keçik bi min xwe navdikin
Hêviyeka Kurda me ez...
Ez nakevim bin destê kes
Nabim xulam û malê kes
Zincîra wan ez çirdikim
Wek pêleka derya me ez...
Bona gelan li her deran
Rizgariya hemû kesan
Bo rojeka azadiyê
Tivingeka cengê me ez...

Cejna we me, Newrozî me
Ez şoreş û bahozî me
Bo serxwebûnê şerdikim
Pêşmergeyê çiya me ez
Bona şehîd misk û gulav
Bo bendiyan ezim silav
Hem saz û awazên we me
Hem çakûçê Kawa me ez

1986

## Welat nadim

Welatê min buhaye ew
Bi misk û ênberê nadim
Wekî dayka min û bave
Bi zêr û cewheran nadim
Dema cejnê û şehyanê
Bi keçkên nazinîn nadim
Çi zore ev? Çi talane?
    Piyala kewserê nadim.

Bi ava kewser û zemzem
Welat hersal ditê şuştin
Xwîna lawik û keçkan
Ji boyî gel ditên kuştin
Ji dildarî û xembarî
Bi rext û xencer û piştin
Ji boyî Kurd û Kurdistan
    Hemî dinya li şûn hêştin.

Welatê min bilindî tu
Wekî Agrî ji zozana
Bi eşqa xwe tu namdarî
Wekî Xanî bi destana
Gelek mêrxas û dilşêra
Ji Kurmanca û Sorana
Ji boyî te dibin gorî
    Li qadên şer, li zindana.

Bi hezaran wekî Evren
Bi hovîtî û talanê
Ketin cengê li Kurdistan
Ku rakin Kurd ji meydanê
Li hember wan serî hildan
Wekî şêran li çolanê
Keç û lawên gelê Kurdin
Dikin qêrîn li cîhanê.

Neyar hatin bi pîlanan
Bi zêr û mal û davên xwe
Hema Kurdên welatê min
Welat nadin bi çavên xwe
Neyar hatin bi sedrengî
Bi rovîtî û cilkên nû
Hema keçkên welatê min
Welat nadin bi zavên xwe
Neyar hatin me berdin hev
Kur û bavan li dij hevdu
Hema lawên welatê min
Welat nadin bi bavên xwe.

1988

# HINDE LÊDANÊN DILÎ

## Cotyaro!

Dest û dêmê te zinarên qermiçîne
Ling û zendên te wekî darên bejîne
Herdu çavên te şikevtên hilweşîne
Ev çi damarin? Wekî axa hişîne
Ev milên te wek dîwarên daketîne
Zarowên te her nexweşin, dilşikîne
Kes nizane ew hene an jî mirîne...

Tirşik û nanê ceyî boyî te hiştin
Lê ji bo xwe çav û laşê te biriştin
Boyî axan gorê zarokan qeliştin
Pîrekên wan naz û rindik rûdiniştin
Awirêd çavan bi çingalin, bi xiştin
Bax û bîstanêd li hawîrê bihiştin
Pîreka te kinc û lingên wan dişuştin...

Karê sê salan te jê anî sewalek
Zadê mala te di salê de çiwalek
Ma ji bo çi? Va kurê te bû şivanek
Ma ji bo çi? Ew nebuye xwendevanek?
Hogirê wî bû, li zozana beranek
Ew li ser pişta kerê reş bû siwarek
Te bi destên xwe kurê xwe kir berazek...

Cotiyaro! Ma ji kê re tu diçînî?
Her nexweşî... bê kiras û bê nivînî
Pir şevên tarî tu bê agir dimînî
Her bi nalîn û fixanî, dilbirînî
Ma niye carek tu jînê bihejînî
Derkevî aza bijî, royê bibînî
Tariya jînê, bi destan hilçirînî
Tola bavê xwe ji axê xwe hilînî?..

Cotiyar û karkeran herdem bi yekbin
Her li hember dewlemendan tev li şerbin
Piştegîr û hem heval û dostê hevbin
Zend û bendê va welatê xweş û rindbin
Roja cengê nola leşker lek bi lekbin...

1978

## Karker

Karker û pala birane
Bo beg û axa gedane
Her li karin, azepin ew
Kes ji wana ne xudane
Dêm zerin nolê nexweşa
Barê wana pir girane

Ew ciwanin, hem bi hêzin
Lê nezanin, hem belane
Ew didin cerg û xwînê
Bo xebat û pêşveçûnê
Hin li Parîsê, li London
Hin li Şîlî, hin li Çînê
Nabîhîsin dengê wana
Qîr û hawarin li jînê
Ew diçin dezgan wekî pez
Bo firotin û kirrînê

Karkerên cîhanê rabin
Wek lehî xwînê birêjin

"Em nema êdî geda bin"

Bo hemû dinya bibêjin
Hilweşînin, dagerînin

Malê wan axan bisojin
Laşê wana bixuşînin
Ên ku xwîna we dimêjin
Her ji bo we destê vala
Tev ji boyî dewlemenda
Dawiya karê we nîne
Bo xwedî dezgan û gunda
Xweşiyarin ew bi mala
Dêmê wana nolê finda
Çi fîxane tê ji pala
Dimirin karker bi derda

Ez dikim hawar û gazî
Leşkerê dezgan li hev bin
Bo xebata serfirazî
Karkerên cîhanê yekbin...

1978

## Rêhevalê min

Ewê ku di gola xwînê re çuye
Ne Memê Alan bû
Ne jî Bozê Rewan bû
Ew dilê min bû
Rêhevalê min bû...

Ewê ku li nav malên goçeran
Bi lêdan û qamçeyan
Bi keviran
Hatiye lêdan
Di xwînê de geviziye
Bi lingan daliqiye
Ne Sad Ehmedê Silîvî bû
Ne dergevanê Mîrê Şamê bû
Ew dilê min bû
Rêberê welatê min bû
Pêşmergê Kurdistan bû...

Ewê ku di tewla Şahê Ereban de
Di nav nalên hespan de
Bi xenceran hatiye kuştin
Di tariyê hatiye hiştin
Ne Hurmizê Îran bû
Ne jî Xorasanî bû
Ew rêzanê rêka Kurdan bû
Ew dilê min bû
Roniya çavan bû...

Ewê ku li "Reichstag"a Hîtler
Dest bi nivîsîna ristan kir
Ne civûtê Berlîn bû
Ne jî hozanvanê Parisê Aragon bû
Ew dilê min bû
Pêşengê gelê min bû...

Ewê ku serî li dijmin hildaye
Ne Babekê Xuremî bû
Ne jî Caferê Dasinî bû

Ew dilê min bû
Lawê Kurdistan bû
Ew tova şoreşê bû
Mazlum DOGAN bû...

1984

## Reyên welatê min

Rê hene bi xwîn
Rê hene bi kevir
Rê hene talî û hêstir
Rê hene serfirazî û şekir...
    Lê belê hemû rê
    Çi reş û tarî!
    Çi geş û şêrîn!
    Tev diçin Diyarbekir...
Reyên welatê min digihin Ho Chî Mîhn
Derbas dibin Hitîn
San Salvador
Namîbiya
Nîkaragua dilbirîn...
    Reyên welatê min
    Bi rûmeta berxwedana
    Bi xwîna gelek DOGAN'a
    Bi destên pala û şervana
    Hatin vekirin
    Zinar jê hilkirin
    Şehîdên Diyarbekir...
        Boyî zarokên Kurdistan
        Û hersê cîhana...

Reyên welatê min
Weke çîrokên dêwan
Bi tirsin dirêjin
Têre diholin weke şêran
Rêhevalên min
Lawjanên hevnetewiyê dibêjin
Li ser milên wan
Klaşnîkov dibirîsin,
Dilojin...

Reyên welatê min
Di dîrokê de bi nav û dengin
Her û her li ser wan şer û cengin
Talankerên Asiya, Roma, Tetarin...
Erebên zengin...
Îngilîzin, Firengin...

Lê îro, li ser reyên welatê min
Top û leşkerên dûrwelatin
Ji her "metropolekê" hatin
Renga-rengin...
Bi NATO xwe navkirin
Dersên gelan dane CENTO, ji bîr kirin
Çi dixwazin?
Berê zûde em talan kirin
Xaka welatê min serbin kirin...

Reyek welatê min heye
MAZLUM bi xwîna xwe vekir
Ew rê tê ji Diyarbekir
Di Asiya re
Afrîka re
Latîn Emerîka re digere
Bi karkerên dezgan re
Şoreşgeran dicivîne
Rêz dike leşkerê azadiya gelan
Bi Newrozê re serfiraziyê distîne
Hemû reyên welatê min dike yek
Leşkerê serxwebûna me
Dadikeve Diyarbekir
Lek bi lek...

1985

# Xwînrêtinê Kuba vejand

Te tirs heye ji kuştinê
Kengê emê bê tirs bijîn?
Dinya li me girtin bi roj
Cergê me de herdem birîn
Nola berê zor û setem
Coyê me ye her tê bi xwîn

Rabe binêr ey fortevan!
Rewşa me Kurda xweş bibînin
Ma kî dijî nola mirov?
Her yek bi jan, herçax girîn
Çendek wekî te sermezin
Tiştek nebû, dîsa revîn
Bo dijminan nola kera
Ser menbera bû şoreşîn
Bona welêt tiştek nekir
Dij şoreşê her zirzirîn

Edî bese, tarî nema
Roja me ye, bi hilm û bîn
Kotik tijî fort û derew
Bo te Swêd bû xemrevîn
Dij şoreşê hêriş neke
Rabe ji karwanî nemîn...

Dengê tivinga şoreşê
Dinya derewvana çirand
Nola brûska têre çû
Tarî ji dinya me revand
Vaye lehî daket gelî
Çerxa gelan nû ve gerand
Dost û hevala şadibin
Bo dijminan hinav keland
Destpêkirin xortên ciwan
Roja me ye, serî livand

Şemdîn, Erug hişyar dibin
Bangê gele NATO hejand
Her şîn dibe tova teze
Bo niştîman dîwar peqand
Serbin dike dûvên neyar
Bê şoreşê kê maf qedand?
Ma rê hene bê xwîn û tirs?
Xwînrêtinê KUBA vejand...

1984

## Helebçe

Siwarê mirinê peya bû
Li bajarê Helebçe.
Bê tang û tiving
Bê debançe.

Zarokên şîrmij, keçên berbext
Û hemû kesên ku li wir.
Siwarê mirinê ji bo Fîron
Ji bo Qaron
Qelfê mirovan da ber xwe û bir

Ta dilê Zehakî vehesîne
Ta sax bimîne
Bo wî ew erş û text.
Jin û zariya
Qaz û qumriya
Pez û koviya
Tev dane ber "senf" û "tabun"
Dane ber "senf" û "tabun".

Di destpêka buharê
Helebçe kirin dûjeh
Bi hezaran kuştin
Helebçe bêliv hîştin
Ta ji xwe re bikin bargeh.

Etarê mirinê li Helebçe geriya
Can û rihên Kurdan
Erzan kirriya
Dayîk û zarowan
Bi dil şewatî
Bi bê tewatî
Bi êşek û fîxan
Dev ji dinyayê berdan.

Ey zalimê xwînmij!
Ey zarokuj!
Ma heya kengê dê tu bijî?
Dê tu Kurdan
Belengazan
Her bikujî?
Ey zalimê xwînvexwar!
Ey teresê har!
Ta ku tola Helebçe em hildin
Emê xwe bikine agir
Wê dayîkên kuştiyan
Rojekê ji rojan
Bi xwîna te kildin
Wan çawên xwe yên tijî hêstir.

Bajarê Helebçe! Ez bi gorî!
Li te dinêrim bi serşorî.
Kurdên me dê heya kengê
Her weha bin?
Li ber lêdanên zaliman
Li ber bahoz û agiran
Her belav bin?
Xwe nekine yek
Nebine tek.

Ta ku Helebçe erzan neçît
Ta ku mirovê me winda nebît
Seriyên xwe ji hev re bitewînin
Hêza gelê xwe bicivînin
Rahêjin tivinga narîn
Hildin ala rengîn
Ji bo serxwebûn û azadiyê
Ji bo mirovatiyê
Dakevin ceng û xebatê
Geş bikin rêka civatê.

Ta ku zarok careka dî biçine
Helebçe
Ji xwe re li wir çêkin lîsgeh
Dibistan û baxçe...

1988

# PÎROZÎ

## Welatê zayînên teze

Pîrozbe li we zayîna teze
Dayîna we...
Silavên germ li xaka genim lê şîn dibe
Kulîlk têde vedibe
Bihn dide...
Silav ji zarowan re
Ên ku manda xwe li ser qûmê
Di defteran de
Li lîstgehan rêz dikin

Silav ji dayîkên pîr re
Ewên ku êzingan li zivistanê
Di bahozên berfanî de
Boyî destpêka buharê dicivînin
Agirekî germ tariya koletiyê
Herheyinê biçirîne...
Silav ji wa çirûska sor re
Ewa ku axaftinên azadiyê û serxwebûnê
Di sînoran re
Di gedûkên çiyayên ku bi hevde girêdayî
Digihîne cîhana kehr...
Silav ji we re, ji hêviyê re
Ya ku weke sazekê pîr û wenda
Ji nû ve dikeve têlên dilovanan
Ji nû ve biharê hişyar dike
Bilbilan bi zar û ziman dike
Û jîna me dixemlîne, dilşa dike...
Silav ji we re birano!
Kurên welatê ku ji bîr buye
Di dîrokê de herdem talan buye
Lê îro weke volkanê pîr
Ji nû ve hişyarbuye...

1984

## Bo Sirwe

Dostekî hêja gote min
"Eve mizgîneka nû
Ji bajarê Ormiye
Kovareka taze
Bi navê Sirwe
Va dema reş de
derhatiye..."

Here qumrî
Silavêd min bibe bo wan
Eve Sirwe
Şevêd tarî
Li ser Kurdan
Diket ronî...
Û erdê hişk
Zuwa mayî... diket avî
Erê Ormî!
Di ser me re gelek dem çûn
Zivistan û bihara çûn
Tenê em man di jengê de
Siwarêd me xweya nabin di qadê de
Û hespêd me vegeriyane
Xedeng û tîr di piştê de
Û rê naçin Mihabadê
Ji nandoza û pasdara.
Û lawê Kurd
Delalê te
"Selahidînê Eyûbî"
Bi sîngê xwe
Di xwînê de...
Here qumrî xiyabana
Biket gazî li dildara... Û wan yara
Here qumrî biket qîrî
Li mêrxasa û şervana
Û bêje wan
Bi nazdarî
Eve Sirwe serî hilda

Hêvî çandin binê dil de
Bihar anî welatê min
Û sêv xistin di darê de...

Dilo bêje evîna xwe
Û hozana bihevxîne

Dilo rabe
Fîxanêd xwe binivisîne
Û destêd van
Hemû Kurdan
Bi xwîna xwe
Bihevgîne.

1986

# MERŞÊN LAWAN

## Canfîda

Ey Dêrsimî... ey Dêrsimî
Çi rewşe ev heya niha?

Em cot dikin, em avdikin
Bi roj, bi şev... nîne buha

Tev çûne jor, bi hêz û zor
Em mane bin destên gura
Aza dibin, serbest dibin
Gelên cîhan, hemû bira...

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Ey Dêrsimî... ey Dêrsimî
Çi rewşe ev heya niha?

Welat birin, perçe kirin
Zincîr xistin destên me de
Bizin birin, arvan birin
Tiştek nema mala me de
Dijminê me, bavkujê me
Rûniştiye mala me de...

Ey Dêrsimî... ey Dêrsimî
Çi rewşe ev heya niha?

Kanî tiving, xencera şeng?
Hevalê te maye kuda
Kanî Remo? Kanî Cimo?
Civîn heye gundê te de

Ey xortino, hevalino!
Herdem bijîn dilê mi de

Hevre bêjin, çi mêr û jin:
"Ey Kurdistan me canfîda
Ey Kurdistan me canfîda
Me canfîda..."

1984

## Merşa lawan

Keç û lawên karkerên Kurd
Hun bizot û agirin
Vaye çerxa rûmeta me
Dil ji xwînê dagirin
Tava roja serxwebûnê
Ala rengîn hilgirin
Dakevin qada welatî
Rê li dijmin bibirrin
Bav û kalan zûde rabûn
Bo hebûna xwe mirin
Axa Kurdistana narîn
Bi xwînê geşkirin.

1983

## Baran barî

Baran barî zevî şilkir
Nav zinaran tijî gul kir
Dilê min kul, dîsa geşkir
                Baran barî...
                Baran barî...
Dost û yara! Mizgîn ji we ra
Şoreş xurt bû, li her dera
Ji evîna dilê me ra
                Baran barî...
                Baran barî...
Dilo! Rabe ji xewnên xwe
Em azakin welatê xwe
Her avakin jiyana xwe
                Baran barî...
                Baran barî...
Şoreş xurte, me bihare
Me Newroze, me avdare
Gelo! Rabe! Dema kare
                Baran barî...
                Baran barî...
Xort û keçan gula bînin
Jinên Kurdan hun lîlîkin
Bo pêşmergan hun gazîkin
                Baran barî...
                Baran barî...

1969

## Lo hevalo!

Berde, berde, lo hevalo!
Destê xwe ji yara dilî
Wer binêre, guh bidêre
Çi dibe li nava gelî

Van neyara, patexura
Hilkişîne nav çiya
Bi lêdana, têvedana
Rêz dikin koma diya

Hin revîne, hin mirîne
Va xulî bê l'serê wana
Raketîne, pişt şikîne
    g nema hilbe ji wana

Êdî rabin, şerme we ra
Hevre em herin beyara
Xort û lawan, nolê şêra
Çûne cengê, pêş neyara

Roja cengê, zinge-zinge
Destê xwed destê mi ke
Bo xebata serxwebûne
Deng li gişt xortan bike

Berde, berde, lo hevalo!
Destê xwe ji yara dilî
Wer binêre, guh bidêre
Çi dibe l'nava gelî...

1985

# Ax Kurdistan!

Gava yarê xwe dibînim
Sebra dilê xwe pê tînim
Mest û serxweş ez dimînim
        Kurdistanê! Ax Kurdistan!
Min çavê xwe li wê gerand
Xewa şeva ji min revand
Xwîn di ber me de rijand
        Kurdistanê! Ax Kurdistan!
Dijminê min zora me bir
Xulî barand, dinya reş kir
Çi bahoze, bihar peş kir
        Kurdistanê! Ax Kurdistan!
Birîndare, dilşikestî
Dijmin şikand per û hestî
Bilbila min gelek westî
        Kurdistanê! Ax Kurdistan!
Emê rabin, serî hildin
Di cengê de em ên merdin
Nola şêrin, em ên Kurdin
        Kurdistanê! Ax Kurdistan!
Emê bidin xwîna xwe
Boyî jînek azad û nû
Bo em bînin dîlbera xwe
        Kurdistanê! Ax Kurdistan!

1981

## Lawî Kurd

Lawî Kurd rabûne îro bo felata xwe dijîn
Bo welatê xwe azakin ji neyar û xwînmijîn

Rengê ala Kurd ji xwîna pir şehîdên şoreşîn
Ên ku rabûne li hember dijminê cîhan û jîn
Kesk û zer hatî ji gulzar û çiyayêd me şirîn
Rengê tava royê girtin ji direfşa Xusrewîn

Lawî Kurd rabûne îro bo welatê xwe dijîn
Bo jiyana xwe azakin ji neyar û xwînmijîn

Nolê şêran bûne evro serxwebûna xwe divîn
Nafiroşin niştîmanê xwe bi Hindistan û Çîn
Dengê topa her li guh tê balafir hatin gerîn
Leşkerêd dijmin şikestin tev ji ber Kurdan revîn

Lawî Kurd rabûne îro bo hebûna xwe dijîn
Bo welatê xwe avakin serxwebûn û herheyîn.

1978

## Hunermend

Dengê te mîna tivinga
Dicivîne van lehenga
        Bo serxwebûna gelê min
        Agir berda qişla dijmin
                Ey hunermend! Ey hunermend!
                Şêrê çiya! Xortê lewend!

Li eywana, li ser bana
Dengê te çuye ezmana
        Qêrîna te ji bo welat
        Xemlandiye kar û xebat
                Ey hunermend! Ey hunermend!
                Şêrê çiya! Xortê lewend!

Tivinga te li nav mala
Şiyar dike law û kala
Ditirsînê wan cehşokan
Reva wan e ji Kurdistan
Ey hunermend! Ey hunermend!
Şêrê çiya! Xortê lewend!

Keç û lawan bi te re çûn
Armanca wan e serxwebûn
Dengê te ye di pîşê de
Xweşî xistî arteşê de
Ey hunermend! Ey hunermend!
Şêrê çiya! Xortê lewend!

Xebata te ji bo me ye
Tova te çand dara me ye
Hewar û herdem gaziye
Daxwaza te azadiye
Ey hunermend! Ey hunermend!
Şêrê çiya! Xortê lewend!

Pêşmergeyê qada şerî
Bona welat qurban serî
Jiyana te baweriye
Pêşengiye, rêberiye
Ey hunermend! Ey hunermend!
Şêrê çiya! Xortê lewend!

1988

## Banga cengê

Xortê Kudistanî
Çeleng û ciwanî
Çima di mal da yî
Herdema paldayî
    Dijmin ketin welat
    Birin deşt û kelat
    Em dane ber kêran
    Aşê wan em hêran
        Rabe, rabe, rabe!
        Rewşa te xirabe

Lawkê Kurdistanî
Ey xortê Botanî
Vane hevalên te
Hemû ji salên te
    Çûne qada cengî
    Bi ala sê rengî
    Tu jî wekî wanî
    Mêrxas û lehengî
        Rabe, rabe, rabe!
        Ev xew bo me nabe

Pêşmerge civyane
Derketin çiyane
Dane soz û biryar
Bikin şerê neyar
        Heya yek jê hebe
        Wê veger tunebe
        Bo welat qurbanin
        Dijmin pê nikanin
                Rabe, rabe, rabe!
                Sistî bo me nabe

Lawkê Kurdistanî
Tu mêr û ciwanî
Vane tev EGÎD'in
Bo welat şehîdin
        Bo namûsa Kurdan
        Can û malê xwe dan
        Bo rûmeta gelan
        Her dikin berxwedan
                Rabe, rabe, rabe!
                Ev rewş wilo nabe

Bila em hişyar bin
Bo welat xembar bin
Tivingan rahêjin
Bikin şerê dijmin
    Dakeve nav gunda
    Bêje hemû Kurda
    Bê tiving û rexta
    Em nabînin bexta
        Rabe, rabe, rabe!
        Nermî bo me nabe

Binêr van cehşoka
Bûne kerên Tirka
Dijmin pê dikenê
Xwe didin kuştinê
    Vaye rewşa kera
    Ji bo nav û pera
    Bûn begciyê sêrgû
    Lêmişt hat û tev çû
        Rabe, rabe, rabe!
        Xulî l'serê wan be

Xortê Kurdistanî
Berê de şervanî
Çima mal da mayî?
Naçî nav çiyayî?
        Netirse j'milîsa
        Ji begcî û pîsa
        Rabe ser lingê xwe
        Rake tivingê xwe
                Rabe, rabe, rabe!
                Tirsî bo me nabe

Lawkê Kurdistanî
Dîrokê dizanî
Here nav EGÎD'a
Wan mûmên şevê da
        Bo welatê bava
        Bo zarokên sava
        Xwe dikin canfîda
        Her ewin canfîda
                Rabe, rabe, rabe!
                Nola pilinga be...

1987

# DERKETÎ

## Derketî

Derdên kevin, kulên giran
Hêriş dikin nola guran
Xwe berdidin binê dilan
Wêran dikin can û rihan

Derdên kevin çi pir dibin
Kulên mezin tev der dibin
Payîze dem pel zer dibin
Dar û mirovan pîr dibin

Hêdî dîtê ber me mirin
Emê herin, venagerin
Ji hestiya cuda bibin
Ji yarê xwe bidûrkevin

Mirin nebû... lê dûrketim
Ji mala xwe bi derketim
Nîvê şevê bi rê ketim
Weke teja ji hev ketim

Li şûn min man dost û heval
Bav û bira... kurên delal
Reya çiya... deşt û newal
Mêwên tirî... welat û al...

Bi dûrketin gundên bedew
Xortên diçûn nêçîra kew
Pîrên dijîn bi nan û dew
Xumxuma çem bi roj û şew

Bi dûrketin dîlan û def
Keçên çeleng, kember sedef
Qumrî... tivîr, datên bi ref
"Gava şefeq hiltê bi xef"*

Bi dûrketin aşên kevin
Pira ketî... reya hesin
Meşkên li dar... zerkên mezin
Bêjing û das... sêl û tevin

Bi dûrketin pale... şivan
Zembîlfiroş û masîvan
Hêl-hêla pîr û zarokan
Hevre diçin nava rezan

Bi dûrketin darên sicê
Merx û geya... mijê sibê
Qeb-qeba kew li pozê çê
Toza li pey pezê li rê

Li şûn min man xebat û kar
Barê giran weke zinar
Bihuşta min bû tar û mar
Welatê min gerden li dar

Sed saline em kar dikin
Malan li pişta bar dikin
Şêxa... mela siwar dikin
Serên xwe jêre xwar dikin

Hinde melan pir vir kirin
Ax û began tim şer kirin
Welatê me serbin kirin
Hebûna gel talan kirin

Dijmin xwîna me dimêt
Namûs şikandin bê fihêt
Hinde melayên rû kirêt
Didane me "Hedîs û bêt"

Herdem digotin: "Ey xulam!"
Were bixûn "îlmil kelam"
Ji bîr neke mafê "îmam"
Berî biçe "beytil heram"

Ji bo welêt devgirtî man
Li ber neyar şikestî man
Mafê kitêba xwe nedan:
"Neçûn cîhad ji bo Xudan"

Axa, bega xwe dane jor
Bi nav û deng, bi peyv û şor
Mal û sewal birin bi zor
Axa gewir... hem axa sor

Hezar salin em kolene
Xêzan û herdem lalene
Kesek nizane em hene
Lê gişt dibên: "Em paşene"

Ji birçîbûn û zêwirî
Zaro dikin gazî, girî
Herdem nexweşin, dilmirî
Kiras kevin, derpî çirî

Cotarê me tim cot dikir
Li pîrekê pir zor dikir
Garis, genim, axan dibir
Ji birçîbûnê pez dimir

Kurdên reben kirin şivan
Kevir, kuçik hildane wan
Bi hin peyayên wek segan
Netew kirin koma pezan

Ez dûrketim ji wan kulan
Lê dil wekî kunê xeman
Agir disoje hestiyan
Nola etûnê bin çiyan

Diya min got: "Kuro veger!"
Bavo kişandin pir keser
Hêstir ketin çavêd Şeker
Zarêd piçûk xwe dane ber

Çare nebû li niştîman
Derman nebû kula giran
Ez dûrketim ji wan deran
Ji dev seg û mar û guran

Çendî li dilsoza gerîm
Weke segan ez pir bezîm
Min tu nedît, te ez nedîm
Erê hevalo, ez revîm!

Ez dûrketim... lê ez heme
Nola welêt ez parçe me
Bindest û hem ez kole me
Wek aşiqê dildarî me

* * *

Ji bîr neke lo derketî!
Ji niştîman tu dûrketî
Wek sêvekê ji dar ketî
Servehesî tu raketî...

Îro li Kurdistan şere
Jîna netew tev agire
Dijminê me sama gure
Her dev bi xwîn... bi gir-gire

Deşt û çeman silav dikin
Gelî, çiya gazî dikin
Kurên piçûk pirsan dikin
Bav û diya te bang dikin:

"Dîsa veger welatê xwe
Destan bide xebata xwe
Wer şîn bike civata xwe
Avê bide gulîlka xwe"

Ey derketîno, em revîn!
Nola firinda dûr firrîn
Bê niştîmanê xemrevîn
Emê li vir çawa bijîn?

Bê niştîman mirov çiye?
Ma kî dizane ew kiye?
Diljar û her şikestiye
Wek bilbilê birîn buye

* * *

Xewnek mi dît şeva berê
Keçek bi lez ji wê ve tê
Dibêje min li nîva rê:
"Bira! Eve mizgîna çê;

Li Kurdistan, welatê dûr
Lawan bi hêz, bi zax û zor
Ala netew hildane jor
Rengîn û geş, bi xwîna sor...!"

(*Ev rêzika ji Ehmedê Xanî ye.)

1979-1980

# NALÎNA SÊWIYÊ KOÇER

## Nalîna sêwiyê koçer

Ax nazinîn!
Ax nazinîn!
Ev dema reş
Wek zêrzemîn
Berdaye dil
Jehra kewîn
Derbûn derbûn
Kanî, birîn...
Bilbil, tivîr bala firîn
Revîn û çûn
Revîn û çûn...
Xem û kula xwe dane hev
Weke gura
Bi hevre tên baxê gula
Xwîn li dev
Xwîn li dev...

Kuve herim?
Çavên te har li pey minin
Wek zirx û topên dijminin
Wek leşkeran wêran kirim
Nola dizan talan kirim
Her mest û gêj
Mîna biwêj
Helbest û ristan distrêm
Bi ser xwe de
Dilê xwe de
Diçim, ditêm
Diçim, ditêm...
Bendîgeha te tariye
Min dil di bin de girtiye
De bêje min
Delala min!
Zor û setem ji bo çiye?
Hêvî hebû ez rêkevim
Ji pençâ te ez derkevim
Bi roj, bi şev
Jîna xwe tev
Bi lez
Bi bez
Herim herim
Bi dûrkevim...

Ax nazinîn!
Ax nazinîn!

Çi rewşe ev?
Çi agire?
Marên mezin
Di pêş me re
Di paş me re
Çi fiş-fişin?
Çi xuş-xuşin?
Evîna te sama lehî
Tijî herî
Ji wê ve tê
Ditirsîne zinar û rê
Diçelqîne kuntarê çê
Ji bin zemîn agir, etûn
Jiyan hemû kir tar û mar
Roma hejî
Leşker bezî
Qeyser revî
Peya, siwar
Ketin... mirin...
"Birca Belek"
Tev hate xwar...

Ax nazinîn!
Ax nazinîn!

Rêve diçim, xemgîn dibim
Pirsa dikim: "Çare çiye?"

Derman ji bo eşqê niye...

Ji mala xwe bi dûrketim

Ji bo kulên xwe bîr bikim
Derdên berê derman bikim
Xwe carekê winda bikim...

Ji ser nû ve
Xem û birîn
Li hev civîn
Gur û segan
Bi hevre man
Li dora min
Digir-girin
Dijminê me
Zincîra wan
Ji boyî şer dirêjkirin...
Ziman, didan
Bi çerxa xwe pir tûjkirin
Ez dame hev
Dêwan bi dev
Parve kirin laşê mi tev...

Ax nazinîn!
Ax nazinîn!

Zarowên te
Hundir dilê min de dijîn
Nola gulên bi hilm û bîn
Hin sor dibin
Hin zer dibin
Bihar, bihar
Gupik didin
Rûgeş dibin...
Bi xwîna min şiqîn didin
Tev jar dibin
Zû pîr dibin...
Xem û kulên wan jî hene
Wekî minin, bindestine...

Ax nazinîn!
Ax nazinîn!

Reya te de min pir kişand

Navê te xew ji min revand
Lê çi bikim?
Çare nebû...
Tim hêviya dilê min bû
Carek ez û te rêkevin
Ji tariya em derkevin
Li nav gelan
Li nav cîhan
Em serkevin...

Ax nazinîn!
Ax nazinîn!

Zanim bi çi tu hesretî
Bo çi serê te daketî
Jar û nexweş
Birîne laş
Xew nayê çavên hilketî...

Yarê girî ji bîr bike
Va çavê şil zuwa bike
Lêv û devê xwe geş bike
Dilsozê xwe serxweş bike...

Rabe binêr
Carek li çem
Pêla dide
Bê xeyd û xem
Jînê dide
Herdem û dem
Zînê çima axîne Mem?..

Yarê hilo!
Ji va xewê
Rabe binêr carek li rê
Hezar diçe...
Hezar ditê
Tev rûgeşin
Nola gulê...

Ez û tu man birçî

Nexweş
Reya dirêj
Bervaj û kaş
Em dane şûn ramana şaş
Aza nebûn
Bi destê caş...

1982

# HELBESTÊN WERGERANDÎ

## Hespê sipî

Ji bakurê rojhilat ve
Hespekî cengê yê sipî dibeze
Bê siwar...
Û di berdehê wî de
Du tîr veniştîne.

Mixabin!
Siwar wendabû...
Wê kî yê pesna hilgavtina wî ya çîkdayî bide?

Şeva dawî
Yek ji wan kesên ki sersiwaran ferman dayiyê
Bo çuyîna cengê
Û niha jî hate kuştin...
Ceng û hevketinan mirinê tînin
Di gelek deryan re...
Qêrînên êşê û hêstirên ku weke befra tev baranê
Di bahozeka zivistanê de...

(Hozanê Çînî To Fo
Wergerandin ji Îngilîzî, 1977)

## Çi jê ma?

Leşkerên Cîn Sî Hiwang
Di welêt re bi hovî û mêrxasî firrîn...
Gava çekên cengê amadekirin
Serekmêran xwe hildan tev me bin...

Bimre malbata (...)
Ma ev har buye?

Împeratoriyeka zordar avadike
Digihe hemû kenarên deryan...
Heftsed hezar bendî li bal wî ne
Weke koleyan dide bin zorê...
Eywan û baxên xwe avadike
Û hêvîdare, ku bi hinde dermanên sihirbaziyê
Ji xwe re jîneka bêmirin bistîne

Xortan —her û her— dişîne geravên rojhilat
Ta ku jê re li herheyînê bipirsin...
Û li pozên kendalan
Bi xem
Çavêd wî li vegera wanin
Û qezenca wî ji vê gişî?
Kelaşoyekî tijî û sare
Têde xuliya bêjîne...

(Hozan: To Fo
Wergerandin ji Îngilîzî, 1977)

## Gotin

Kulîlka piçûk got:
"Naxwazim di zivistanê de bimirim;
Çiku sermaye... berf û barane..."

Çûkeka piçûk got:
"Naxwazim di bin ewrên reş de bimirim"

Mizgînê jî got:
"Naxwazim bimirim, ne li zivistanê
Û ne jî li havînê...
Zivistan sare, qerisiye
Û havîn germe, bi tîne..."

Gişa ji biharê hezdikirin...
Lê dîrokê û serpêkan em hokirin;
Ku mar jî li biharê şiyar dibin
Û di nava çîmen de
Dav û kemendan ji çûkan re vedigirin...

De bila em şiyarbin...

(Hozan: Hamîd Bedirxan
Wergerandin ji Erebî, 1977)

## Rewşname

Ez li derekê ji dayîk bûm
Li ser va erdê
Lî xaneke demê
Wek zayîna her mirovekî dî...
Li Kuba an jî li Qore
An wekî zengmirovekî li Afrîka...

Ez rojek ji rojan
Bi cejna zayîna xwe şanebûm...

Ne ji ber ku dîroka zayîna xwe
Nizanim
Lê ji ber ku dirêjahiya jîna xwe
Ez bi axê re
Û bi hevcarî re mam...
Weke "Bariya" yê Hindî
Û Mujîk'ekî ji bakur...
Û di şevan de
Ez mam bi divît û defteran re
Û min nizanî bû kî çax dimirim
Û çawa dimirim...

Ez ji jînê hobûm nivîsandinê
Û xwendinê
Û boyî çi mar jehr dide...

Ez ji xwe re li kêfxweşiyê negerîm
Li wan çelîkên zêrîn
Yên ku di çîrokan de...
Ez mijûl dibim bi fêkiyên pîkinan
Ewên ku li baxên welatê min...

Ez tu caran bi kelên miriyan
Û bi ariyê nelîstim...
Gava min ronahî dît
Di çavên royê û gel de
Hingê ez zaro bûm...
Û min reya xwe qelaşt...

Min perên renga-reng
Weke yêd firindan hilnegirtin
Weke "Kardînalên Bonn'ê"...

Min bihîst ku dibêjin:
"Kurê mirov nikane serê xwe hilgire"
Û ez dibêjim:
"Cîhana me ne reştariye.
Seriyê xwe deyne ser sîngê gel
Ser axê.. û dilguman nebe!..
Çem, ezman û deryan hembêzke
Bê tirs û dudilî...
Û dilsoz bijî bi karkeran re
Ewên ku rastiyê di şevan de dipên..."

"Êwên ji cîhanekê dikarin ji hev fêmbikin".*

Û bawer bike, ku jîn ne:
"Solin şilin û kokin şikestî, di
pençа pêçekan de ne"**

Lê jîn bawerî bi paşerojê ye
Xebate û hevkariye...

## Koçnameya min

Koçnameya xwe li ser destê xwe dinivisînim
Hestiyên xwe ji zemîn û demê re dihêlim

Goştê xwe ji kurman re...
Û belkî bibine dojehan, beyî ku dilê min razî be...

Nizanim...

Lê mejî û heyîna wê
Ji zayînên teze re
Di her demekê de
Gava her berbangekê...
Ji zarowan re...
Ji dilê min de.

(*Andrê Cîd gotiye
**Pablo Neruda gotiye)

(Helbest: Hamîd Bedirxan
Wergerandin ji Erebî, 1977)

## Di tava hêvê de

Dengê diholên cengê
Ji newalê tê
Rê tazîne...
Dengê ordekên çolê
Ên ku bala difirin
Ji dûr ve çalak tê
Di va şeva payîzê de
Hêviya nameyekê, ku ji mal bê
Dixîne dil

Niha, li vir
Mij dibe bûz...
Tava hêvê, li welatê min
Şewq dide...
Birayêd min ji hev belavbûne...
Û niha, li mal
Kes nîne bipirse, ku ez heme
An mirî me...

Lê... bo çi ez xwe bi van hizran disojim?
Ger em di aştiyê de jî bin;
Em gelek dûrin, ji mal;
Ku axaftinan bibihîsin...
Niha...!
Di cengê de...
Heye hêvî?

(Hozan: To Fo
Wergerandin ji Îngilîzî, 1977)

# Bênder

Li bênderan
Xewn bi hişê min dilîze
Di siya kerê xwe de rûdinim
Ewê ku bi kutikekî ve
Li rex min girêdayî
Û devê xwe yê nazik
Bi milê min paqij dike.
Di ser deştan re
Pêleka sipî ji tava royê dirêj dibe
Têde komikên çinandî avjeniyê dikin.
Kosî jî hatiye xwe germ bike...

Zendê bayê, ku bi bihnên nerm dagirtî
Bi sistî û hesanî dilebite ku bilive.
Û siya çêlê li ser roniya bi tîn
Perçemekî mezin û reşe...

Gundî zêçên xwe hilgirtine û li wir
Gundekî nû avakiriye
Û segê wî yê pilingî
Êşîka mala wî berdayî û bi geya pêçayî
Bi tenê xwe dipê...

Royê bi roniya xwe
Komika gênim vedayî
Komika wek maxeka piçûk ji axa zêrîn.
Û siya dara gewr û geş
Weke kirasekî tenik ji bûka teze re...
Û ez di siya kerê xwe de rûniştî me
Mijûl dibim, hizrêd xwe dikim
Li ser mêrxasên axê, ewên ku hema
Dasikan bi dîwaran dixînin
Bi lez û bez diçin ga fêr bikin
Kaşkirina cercerê.
Hizran dikim
Li ser rêberê ku axa bênderê dûz dike
Û bi xwe loqekî kevirî dikişîne
Ewê ku miltanê wî di sîng re çiriye
Di xwehdanê de mayî...

(Ji "Lawjana nên"
Destana Danêl Warojyan ê Ermenî
Wergerandin ji Erebî, 1983)

## Pirsên çalê

Gava çi bombe din bi ser zarowên başûr de nebarin
Ma ezê kanibim li ser erdê bigerim?
— Çima tu dipirsî Kuro!
— Divêm ezmên bibînim dayê!
Ma ewr hişînin?
Divêm royê bibînim
Rast ronahî zêrîne?

Gava çi bombe din nebarin
Ma ezê bêm hîştin, ku li ser erdê bigerim?

— Çima tu dipirsî kuro?

Divêm daran bibînim, ma rast pelêd wan niha dilivin?
Divêm gulîlkan bibînim, ma bêhna wan xweşike dayê?

Gava çi bombe din nebarin
Ma ezê bêm hîştin, ku li ser erdê dîsa bigerim?

— Çima tu dipirsî kuro?
Divêm rê bibînim, kuve ew diçe dayê?
Divêm gundê me bibînim
Ma hîn dexlên birincê û bax mane dayê?

Gava çi bombe din nebarin
Ma ezê bêm berdan, ku dîsa li ser erdê bigerim?

— Çima tu wilo hertim dipirsî, kuro?

Divêm ap û meta ku hezdikim dîsa bibînim
Ma hîn ewan şer dikin?
Divêm "Yanke" bibînim
Dayê, ma ewan jî mîna mirovanin?

(Hozan: Tê Hahn, 1971 / Vîetnam
Wergerandin ji Îngilîzî, 1986)

## Leşkerên hêviyê

Werin zarokno
Zarokên welatê min
Zarokên hemû welatên cihanê!
Em ji çavên xwe hêstirên sotinê
Dudiliyê û keserê bimalin
Em dest pê bikin lawjanê xewê
Em hemû lawjanan bikin yek
Û bi yek dev...
Bila bi bahozan re li hemû cihanê belav bibe...
Di derya û çiyan re
Bi bajarên mezin re
Di okyanusan re...

Gava ez piçûk bûm
Navan ez ditirsandim:
Îskenderî Mekadonî, Cengîz Xan
Daryosê zordest û Kîpiyadês
Û gava Tîmur Leng dihat bîra min
Min tufî ser axê dikir!
Ez ji darên rengê hovan ditirsim
Weke çawa hûn ji kuştewarê Guevera
Û Lomomba, kuştewarê gelan heznakin...

Di seferên şevî yên xewna min de
Ez bi Huseyin û laşeyên beriya Kerbelê re
Dimam... Lê, hun di xewnan de
Laşeyên ku di dev segan de dibînin
Li beriya Sînayê...
Sebra û Şatîla...
Sor û Seyda... Salvador û Pretoriya...
Kêr di stûyê çûkê de ye...

Gava em piçûk bûn. Napalm tune bûn
Lê bîranînên bi şewat
Sungiyên serbazê reş, di leşkerê
General Goro de...
Em çiqas digiriyan —ez digiriyam— me zarokan
Bi ser şehîdên deşta Girnate de
Û çiyayên Estoriya
Çiqas di bîra me da bûn,
Ayinên Hemze, Huseyin û Rustem
Lê, hun bi navên Cemile û Guevera yê mêrxas
Zoba û Mezlum dipeyivin...
Çi rojan ez ne bi Danton û Mara re bûm
Ez bi Babof re bûm...
Lê, hun bi min re niha Mehmud Derwêş
Semîh Qasim û Tewfîq Ziyad dixwunin...

Werin ey zarokên welatê min
Û zarokên cihanê...
Em rêzên xwe bikin yek
Pêlên ji xeydê
Pêlên ji hezkirinê
Hevre em bilivin
Û li wir... Li hêviya nan û şokola
Li hêviya dêmên kenok dayîkan...
Em şer bikin dostino!
Zarokên welatê min û hemû cihanê
Dijî çekên Notronî û Emerîka...
Ji bo defteran, nivîsaran û avê
Ji bo ezmanê şîn û firindan
Ji bo genim û gulîlkan û baxan
Werin em bicivin, hemû piçûkên cîhanê!
Leşkerê me wê pir mezin be
Ji çendek zarokan
Leşkerê me wê ber bi rojên şirîn û
Ronak... bimeşe...!

(Hozan: Hamîd Bedirxan, 1983 / Şam
Wergerandin ji Erebî, 1985)

# TÊBÎNÎ

Agirî: Çiyayê Agirî (Ararat)
Aragon: Hozanvanekî Frensî
Babekê Xuremî: Şoreşvanekî ku li dijî Abbasiyan serî hilda
Badenoş: Ê badê vedixwe
Baz: Çuka Doxan
Belan: Gingil
Bendî: Girtî
Berdeh: Kortan
Berger: Rica kirin
Bervaj: Ters
Beyar: Çol
Berzencî: Welatparêzekî Kurd bû

Bênîşe: Bê nimûne
Bêvac: Bêhiş
Birca Belek: Li Cizîra Botan e û di Destana Mem û Zîn de derbas dibe
Biwêj: Hozanvan
Bîjî: Ê bavê wî ne diyar
Bonn: Bajarekî Almaniya
Caferê Dasinî: Dîsem, Lehengekî Kurd di dîrokê de
Cedel: Diyaletîk
Cerg: Dil
Cerx û felek: Dem û dewran
Civ: Civandin, Komkirin
Co: Erqa avê
Cobar: Erqêd ava baranê
Çalak: Liva sivik
Çîmen: Cihê geya lê pir dibe
Çivîk: Çûk
Dav: Xefik
Daxe: Daxîna
Deban: Çek, Sîlah
Derge: Derî
Dexsîn: Hesûdî, Dilpêmayin
Dêrîn: Mulkiyet
Dibrîsîn: Dibiriqin
Dihol: Def
Diholin: Meşa şêran
Dilojin: Gava ku mirovek xwe di rê de bihejîne
Dilsotî: Dilşewitî

Dipên: Nobet
Direfş: Al, Tox
Ditê: Tê, Dihê
Divît: Pênivîsa avreşkê
Dîn: Dîwane
Dojeh: Cihennem
Dûzan: Denge
Enkur: Perçek ji erdê piçûk
Etûn: Dojeh
Evro: îro
Êrûg: Dih (Eruh)
Fela: Berî
Felat: Xelasbûn
Fermû: Kerem bike
Firind: Teyr, Kotir
Fîxan: Nalînên sohtinê
Fort: Derew, Pesn
Fortevan: Derewkar, pesndar
Gawir: Kafir
Gedûk: Reyên piçûk û zirav nava di gund an çiyan de
Gerdon: Felek
Gihan: Sing
Gilgamiş: Destaneka dîrokî ji Mezopotamiya
Gorî: Şehîd
Gupik: Kulîlkên nuh vedibin
Hemêzk: Destikek, Tutam
Hêlîn: Lîs
Hitîn: Cihê serketina Selahaddînê Kurdî (Eyûbî)

Hov: Wehşî
Hozan: Helbest, Şiîr
Jan: Nexweşî
Jeng: Zincar, Pas
Kab: Ejnu, Çok
Kadiz: Reyeka stêrkan li asmanan
Kal: Mirovê nav sal
Kelaşo: Darbest
Keştî: Gemî
Kevrin: Kevirin
Koh: Çiya
Kort: Ciyê daketî
Kotik: Tur
Kovan: Derd û kul
Kuda: Li ku de rê
Kulî: Kuleh
Kût: Seqet
Lan: Ciyê raketina şêr
Lawjan: Merşên lawan
Lehî: Lêmişt
Lîlî: Kîlîliya keçan
Loq: Bangêr
Max: Mezel, Ode
Melûl: Stûxwar
Menber: Cihê xutbê
Merx: Dareke
Mestin: Serxweşin
Mexilîne: Hêştir rûniştîne.

Mêlak: Kezeb
Mi: Min
Mindal: Zar
Nalî: Hozanvanekî Kurd bû
Nandoz: Ê ku xwe ji bo sûdên piçûk difiroşe
Ne'j: Ne ji
Neşêm: Nikarim, Nikanim
Niye: Tuneye
Nûner: Temsîldar
Patexur: Sagê nandoz û cas
Pîç: Xirabe
Pîkin: Çiqil
Pîremerd: Hozanvakî Kurd bû
Revrevok: Tirsonek, Revok
Rîbar: Çem
Qad: Meydan
Qeşmer: Henekvan
Sad Ehmedê Silîvî: Siyabend
Sama guran: Mîna guran
Selîne: Ji hev ketine
Sema: Reqs
Senf: Jehrekî kîmyevî
Serpêk: Tecrube
Servehesî: Bêkovan
Sic: Dareke
Sirt: Gir
Sirwe: Kovareka Kurdî li Urmiye
Sotime: Şewitandime

Soweto: Li başurê Afrîka cihê serhildana reşan
Sur: Heybet
Şano: Tiyatro
Şar: Bajar
Şemdîn: Şemzînan
Şiqin: Filîz
Şokola: Çikolat
Tabun: Jehrekî kîmyevî
Tengijîn: Tengbûn
Tej: Ketî
Tewat: Tebat, Aram, Hedar
Tewla: Merbend
Têvedan: Dehf kirin
Tivirk: Babeteka teyran a mîna qumriyan
Tivîr: Tivîrk
Trên: Çîman
Vejand: Vegerande jînê
Veniştîn: Çikandin
Zax: Hêz
Zengin: Esmer û zerikin
Zerî: Bûk
Zêwir: Nêrîna birçiyan
Zuha: Zuwa
Xedeng: Tîr
Xef: Dizî
Xinav: Çix
Xiyaban: Tax û reyên di nav bajaran de
Xulxulî: Avê toxumîn

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Bûhatî: 7,50.-DM